BELQITÎ

Serkeft Botan

Her roj
Roj diçû ava hildihat
Di avrêjna dilên min de
Diherikî sarinca dîroka têrnex-
warî
Û emrê min
Yên nîvqurmçî
Bi kenê leglegê ve daleqandî
Di bîra hesîrtiya min de kox
vedida...
Fetisîm
Ji bêhna xwedana feodaliye
Diniqirim
Ji niqrikên potînên çavsoriyê
Bi senfoniya tirsê
Mirin min didaweşandin
Ji goristanên kiryarê nediyar...
Derdor û cîran ne besbûn
Cîhanek bûye dijminê esme-
riya min
Welatê min seraser
Bûye potansiyela terorizmê

Tunekirin û jenosîda min
Ez nizanim çima bûye meşrû
Li vê dinyê..
Ma dibe ku mirov di bihara de
bimire lê
Ku neyê dîtin agirên newrozan
Û ku binevşa mirov neke zer-
zeng
Va min dilê xwe ji te re aniye
biharê
Emrê min bike zerzeng
Û
Safbûna zaroktiya xwe
Xewnên xwe ên basko kirî
Teva xarên xwe
Min xistiye xwêdana qinê gûzê
Di bihara de li ser baskên ba-
niya
Xwedêgiravî min ê bi wan bi-
leyista..
Hilanyê dayê hilnayê dilê min
Di hucrên teng de
Hilnayê xarê çavên min di
şibakên bê stêr de
Hilnayê ewiqandinên min di
asoyên teng de
Hilnayê emirqutbûna min di
cûtinên dev de
Bûm ê şûna derblêdanên
çakuçên hedadan
Diniqirim hûrik hûrik
Diteqilim tolik tolik
Difesilim zolik zolik
Di nava lepûşkên dekdîloyên
qesrên ewlekariya zilmê de
Bi her lêdanek tûşê
Pûç dibû bedena bêzariyê
Dibim puşperdên tûşên dadge-
hên çavsoriyê
Û mirin
Dilop
Bi dilop
Dibû filq
Ji tûjbûna penûsên dozgeran
diderizî darizandin
Kor dibû
Cîhanek
Xwesayek
Xwedayek
Xwêdanek
Hêviyek
Ciwanek
Dibelqitî
ji bestikên pêxêlên bi tomet...